

HEJMAR

17

%100
KURDÎ

pîne

"EZ DI KODÊN TE YÊ GENETÎK DE BIRÎM!"

KOVARA QERFÎ Û WÊJYÎ



kovara qerfî û wêjeyî ji panzdeh rojan carekê derdikeve

1-15 temmuz (fîrmeh) 2000

Sayı: 17

500.000 TL

AMADEKARIYA VEKIRINA TÎPA F AN MIRÎGEHÊ DIDOME!



AMADEKARIYA VEKIRINA TÎPA F AN MIRÎGEHÊ DIDOME!



'EM TIRK IN!..'

Diyarî bo bîranîna Şehîdên Sêwasê!..

Me bi çavê serê xwe nedît, kal û pîr û navserayan heykat dikir, digot, "Me cem û semah, bi dizî, girêdidan, loma yekî li ser xênî dipa!" Lê wan dîsa jî digot, "Em ji Xorasanê hatine û heta heft û hetf bavê xwe tirk in!.. Atatürk mîna Hz. Elî bimbarek e!.."

Ecêb û sosreta giran, van kesan ev gotin bi kurdî digot: "Em tirk in!" (Çawa em ne kurd in!.. Em di nava elewiyên tirk de hînî kurdî bûn!). Her çend gelek deyişên (stranên dînî yên elewiyên) me tirkî bûn jî, me tirkî ji bîr kiribû û hînî kurdî bûbûn!..

Piştî em çûn Tirkîyeyê. Kesî qala kurdayetiyê nedikir. Dema mêvanên tirk dihatin, her kes dihatê hişyarkirin, "Bila kes kurmançî deng neke, nivan hatin!.." Jixwe çaxê yên ku bi tirkî nedizanîn dihatin, nedihîştin ew werin hinda mêvanan; ew wirûs û mîkrop bûn!..


Di vê navberê de me jî zarokên kurd dida ber kevîran û digot, "pîs kûrtler", lê me ew kevîr diavêtin xwe jî!..

Bêguman doza kurdayetî û elewîtiyê jî qedexe bû, lê li cihê ku dewlet tunebû, di nava malê de bi tenê kurdayetî qedexe bû. Digotin, "Bi kurdî deng nekin, hûnê di sinifê de bimînin!"

Paşê yên ku wisa digotin çûn Ewropayê, gelek jê bûn welatparêz; zarokên wan neçûn dibistanê tirkan, lê ew dîsa jî pê re tirkî peyivîn. Ma hewceyî dewletê ye!.. Me kurdî fêhm dikir, lê dema dipirsîn, me digotin, "Em fêhm nakin!". Li aliyê din me digot, "Em elewî nel!". Ji ber vê çendê êş û jana me ji ber kurdbûna me bû, bêhtir!

Dawiyê ji bo ku hûn berê xwe nadin, tevgera kurdan, dewletê da ber dilê we û ji we re "cemevî" ava kirin; hinekan jê, bi çirtik û lotikan teqla xwe di pereyên dewletê de wer kir!.. Ma Meres, Çorum, Sêwas, Gazî bi tenê ji ber elewîtiya we qewimî? Gelo çima kes dengê xwe ji İzzettin Dogan re nake!.. Û niha dewletê naxwaze ewrûpî jî bi we re biaxivin, lewre elewiyên li gorî dilê xwe dixwaze!..

Me ev nivîs nivîsî, lê me av koland! Loma yên divê vê nivîsê bixwînin, jê fêhm nakin, ji kerema xwe re jê re bixwînin!..Lewre ew bûn kemalîst, sosyalîst, anarşîst, lîberal, materyalîst, budîst, manîst, satanîst û hertîşt, lê nebûn kurd!..Lê çavê min, "cihê pêxwas li ber sol-dirû ye!"




Li Wanê jî OHAL betal kirin.



Întiharên leşkeran hê jî didomin!? Leşkerê bi navê Mehmet Barinç ku jî xelasbûna leşkeriya wî re 5 roj mabûn, xwe kuşt!?



Doza namûsê dil û hinavan dişewitîne.



Pêşketin û vedîtînen di warê genetîkê de çav li mirovan kirin tas!

Li Amerîkayê reşîkê bi navê Gary Graham jî hate îdamkirin!



Mebûsê MHP'ê Cemal Enginyurt li meclisê zûriya.



Waliyê Êlihê got: "Heskîf zîkê me têr nake!"

EZ BI HESKÎFÊ TÊR NEBÛM!.. KU EZ BELKISÛ ANINÊ TÎ




Cemal Enginyurt li meclisê zûriya.



Waliyê Êlihê got: "Heskîf zîkê me têr nake!"

EZ BI HESKÎFÊ TÊR NEBÛM!.. KU EZ BELKISÛ ANINÊ TÎ





Têbînî: Mala xwedê ava, niVsa Rahmî Batur negî-hîşt ber destê mel.. Aqubet li serê hejmarên din bel..

GOTINÊN ECÊB

- Emîne
- Qutik sorê bi pîne
- Li dawiya koçê nemîne
- Xelkê te birevîne
- *
- Evdila
- Mirê mila
- Şûnikê cila
- Ji diya xwe re çû pişkula
- *
- Xelîlo
- Simêl soro
- Por helîlo
- *
- Elif û bê
- Min keça melê divê
- *
- Misto
- Kusto
- Du gulisto
- Doxînsisto
- *
- Heso
- Kera bixeso
- *
- Metê
- Ji kerê de ketê
- Ker fetisî
- Met reqisî
- *
- Hecî
- Golik behecî
- *
- Hecî
- Kuncî
- Bêrincî
- Osirixta îkîncî
- *
- Axa
- Rêx bi lepa avêt asraxa
- *
- Hacana
- Gû dikin fîncana
- Ne dixwin
- Ne didin cîrana
- *
- Min sar e
- Qûna min dar e
- *
- Min germ e
- Qûna min nerm e
- Remo Remo repisî
- Qûna kerê reqisî
- Ji bo nanê tenûrê
- Tenûrê de fetisî
- *
- Stenbolo
- Qîzik bolo
- *
- Mala te ava
- Xwedê bike zava!

NEÇIRVAN A ÇIĞEK



XANIYE ME PAR XWEŞ BÛ!!
GAR MAX BÛ Û KERANE WÎ JÎ
JÎ DARÀ MAZIYE BÛN!!

MA EV GÎ TÎŞTEKE!
ESIL TE TEQ Û
SVINGÊN ME
BIDÎTANA

MAX...
KERANE



EV ZILAMÊ
LI PAŞ ME SIBEHÊ DE
LI ME GUHDARÎ DIKE
NE POLÊS BE
HEÇÎ?

BISIMÛLAA!
KIRO EM HATIN
STENBOLÊ JÎ DÎSA
JÎ VAN NEFLITÛN...
LÊ NAŞIBE POLÊSAN
JÎ. DIBE KU AJAN
BE...



TE DÎT! EW JÎ RABÛ.
BAYOOL! GOTINÊN ME
NOT DIKE... ŞEY TANOK!


KIRO ME
QAIA SIYASETÊ
JÎ NEKIR?
(AHEWLEBE!)



HEÇÎ EV ÇI
BEJA YE.. MÎNA
NEÇÊTIRKAN
E!..

KIRO WERE EM WÎ
ZEFT BIKIN.. JIXWE EM
DI SUREÇA AŞIYÊ DE NE.
TÊRA XWE WÎ
BIKUTUN...

NEÇÊTIR!



WÎ!! KURÊ MIN. MA TE ÇIMA
NE GOT EZ JÎ ENSTÎTÛYA KURDÎ ME
HEYRAN?..

HELAAA!
TUYÊ VAN PEYVAN
ÇI BIKÎ HEVALÊ ZANA
JÎ BO DU KELÎMEYA
TU XWE DIKÎ WEK
SIXURAN

XALO
DESTÊ TE SAX
BIN.. XEM NAKÊ..
TU KARÎ PEYVA
XWE YA DAWÎN
DUBARE BIKÎ




YA-ALAH!
BÊNAMÛS!.. DE
WERE HA!

GORA HEFSED MEZINÊ TE...
EM JÎ VAN MIXTARAN XELAS
NABIN QEY!..

EMXK!
XAL... 100!
EZ... REWS...
FERH...



MA AMADEKIRINA FERHENGÊ ŞUXLÊ
ZAROKANÊ!.. EV FERHENG BI HEFT
KUL Û DERDAN HATE ÇÊKIRIN! ZANA.
BÛ NEÇÎRVANÊ PEYVAN. DEMA NEÇÎRA
WÎ DIHAT, QET GÛYÊ WÎ NEDHAT. WÎ
JÎ QULKA MIŞKAN PEYV DE RXISTIN!
BÎRA TE GES, PÊNÛSÊ TE ŞIN BE!..



EZING

Şeref Mumcu


Ezing@mynet.com.tr

- Hesen Abê hî hî hî!
- Kuro kar û işê te girîn e. Evdalo parîkî jî min elktîrîkê bistîne. Binêre ezê te biavêjim çi ortaman! Ezê hîni te bikim. ka mirov keçikan çawa dibe kadînê!
- Abê 58 penaber di tirê de xeniçîne, ez çawa negirîm.
- 58! Ezê bi 58 caran birîm serê te. Lawo ez dibêim dims tu dibêjî dew! Sêwîyo ev slo-gana min baş bixe serê xwe an qûna xwe. Marê ku bi min ve nede bila hezar salan bîjî.
- Abê parîkî duyari! be. Ez gûyê te bixwim
- Dev jê berde kuro, ka pelê cixarê bi te re hene?
- Bila pelê cixarê bibe kuçikê te, titûna ku derê ye!
- Plaqeyeke esrara min heyê ka em bipêçin.
- Esrar! Abê tu mala min neşewitîni, polês molês, şeş zarokên min hene.
- Polês hevalên min in, evdalo!..



KU TELEFON JI MIN RE
BE, EZ NE LI MALIM!

ZIRRR - ZIRR




GELT AMEDÎNO, DAŞIRA SEYAR!
BIGÛK 50, MEZIN 100 HEZAR! BI XWE
DE NEKIN! ŞEMO, DAŞIRE TÎNE BER
QÛNA WE!..

XWE DÊ YO, MEJÎNÊ MIROYAN
DEMA BIRGÎ DIBIN, ÇAWA
DI ŞI XULE!.. LI VÊ SOSRETA
GIRAN BINÊR! XWE DÊ ME
JÎ ROVÎYÊN PEYVAN
BISTRÎNE! EZ ZANIM
WÊ ÎŞ MEZIN BIKE Û
PEREYÊ GELEK FEQR-
AN BIXWE BELQIYO!



VAYE DU SENDELÎYÊ
VALA HENE!..
EM LI VIR RÛNIN!

LAW HEÇO, ME LI
TOTÛYÊ XIST! EV
KEGÊ SOSRET, DIBÊN
QEYEMSENDELÎ
NE/HIS!.. QET
DENGÊ XWE
NEKE!



HELAL BE JI TE REZANA!
BI XÊRA TE ME XANINÊ XWE
XELAS KIR! KÊMASIYA ME
DERÎ BÛ, ME EW JÎ BI
FERHENG A TE TEMAM KIR!





KEREM KE!

ERTÛG SONMEZ

KOMARA DÎNAN Û DÎNÊN LI
SER TÊLÊ!

Di 23ê pûşperê de, di programa Rojbaş a **Mezopotamya Tv**'yê de bi awayekî zindî bi **Helîm Yûsiv** re sohbetek hebû; sohbeteke xweş bû. Bi rîya wê sohbetê me hin alîyên din ên Helîm Yûsiv jî nas kirin. Ji mijarên wê sohbetê, yek jî ew bû ku **"Helîm çima li ser dînan dinivîse?"**

Helîm hinekî bersiva vê yekê da û pişt re got "Min ev dîn her çend hemû di vê berhemê de anîbin ba hev jî, lê ew bi xwe di dilê min de ne jî!" Paşê telefonên temaşevanî! (çend telefon ne tê de) Beşê herî balkêş! Yekî telefon kir got: "Ez wî xortî baş nas nakim, min berhemên wî nexwendine, lê baş dinivîse!" Yekî din: "Min heta niha tiştekî wî nexwendiyê, lê çima bi kurdî nanivîse!"

Yekî din: "Ez jî piçekî dîn im, gelo ez dikarim tiştekî bixwînim!"

Birayê heja Helîm, ez li vir bi navê **"Dînan Li Ser Têlê"** semivîsekê ji bo kurteçîrokekê diyarî te dikim, êdî tu û şîyan û kanîn û dînan xwe!

Hafiz mir!


Yanê Hafiz Esad çû rehma Xwedê! Gelo nizanîm pêwîst e ku ez bibêjim Kurdistan çar parçe ye, ji wan parçeyan yek jî Kurdistanê di bin destê Sûriyeyê de ye! Yanê Hafiz Esad çû rehma Xwedê! Û ev serê 30 salan e ku Sûriyê û ew parçeyê me di bin postal û potînên Partîya Baas û Hafiz de ne! Yanê Hafiz Esad çû rehma Xwedê!

Û dîsa 30 sal berê vî Hafizî û vê Baasê biryara **"Kamera Erebî"** girt û bi vê "Kemerê" Kurdistanê bin destê Sûriyeyê bû du parçe. Yanê Hafiz Esad çû rehma Xwedê! Gelo hûn dizanin ku ev "Kemer" çi ye? Ez bi xwe çûm Kurdistanê Sûriyeyê û min bi çavên serê xwe dît: Li seranserî Kurdistanê ereb bi cih kirine. Gundên herî xweş yê kurdan ji dest wan girtine û erebên beriya Sûriyê anîne li vir bi cih kirine.

Yanê Hafiz Esad çû rehma Xwedê! Gelo nizanîm hûn dizanin ku li Sûriyeyê 200-300 hezar kurd bêhuwîyet (kimlik) in. Û ew li ser axa xwe, wekî macir têne hesabandin. Tu heqê wan tune; nikarin xaniyekî bikirin, nikarin bibin memûrê dewletê, yanê di warê resmîyetê de hîç maf û heqekî wan tune.

Yanê Hafiz Esad çû rehma Xwedê! Çû rehma Xwedê, çû rehma Xwedê! Bila serê malbata wî sax be û bes! Lê ez nizanîm çi bi me kurdan ketiye ku di rojname, kovar, televîzyon û radyoyan de pesnê wî didin. Behsa başî û qenciyên wî dikin. Hela tew li hin bajarên Kurdistanê ji bo wî kon vegirtine, şîna wî dikin! **Bavê Nazê** digot **"De were kirasê xwe neçirîne!"**

Erê welleh! Hema bi qasî ku em pesnê dijminên xwe didin, behsa çêyî û qenciya wan dikin, me piçekî qala yê xwe bikira û pesnê yê xwe bida, belkî em niha ne di vî halî de bûn! Jixwe ji berê de bîlleheq negotîne **"Ji xelkê re masîgir e, ji xwe re kosîgir e!"**



BINÊR DELALA MIN!... MIN
MASIVÊ KU BI DEPREMÊ DIHESE
STAND, BÊHNA XWE FIREH KE!



DIVÊ EZ ÎŞEV KURO YABOO! BAVO!...
KAPİTALÊ BI-TU ÇAWAYÎ XURFIYD!
XWÎNIM. SIBÊ JÎ FREUD...



Xezên Beredayî

Muht
SER

LOZAN



Haydar IŞIK

MÎZA PRENS

Prens Ernst zaf dewlemend o. Cenika ey çena (keyna) prensa **Monako** ya. Yanê hurdmîna çey (keyey) hetê male dîna de zaf xort ê. Milk esto, mal esto, perey estê. Jû vaten esta, 'Pereyê dewlemendan fekê feqîran qefîlîno'. Nika ez çira na dewlemendî ser qesey kena?

Prens Ernst August sono **Fuarê Hannover**, uza zaf simeno. Eke pêniye de sono çe (keye), ferman dano şofêrê xo û vano, dêse pavyonê tirkan ver de vînde. Şofêr vîndeno, prens ereba xora yeno war û mîza xo vardeno dêse pavyonê tirkan.

Nika îta her kes vanê, çira prens dêse fransizan, rûsan ya jî mîletanê bînan de mîza xo nêkeno, îlah dêse tirkan wazeno.

Sebeba na mîz kerden çî bi? Tayê vanê, prens tirkan ra hes nêkeno, coka mîza xo erzeno dêsanê tirkan. Heveyê vanê ha prens mîza xo ita vardê dêse pavyon, ha jî vardê dêse Enqerî, ferq çîno (çinyo).

Coka siyasetharê tirkan qarenê. **Ecevit** vano, çiya niyanen ma ra haqeret o. Ecevit hona fam nêkeno ke xora prens jî aye wazeno.

Siyasetharê partiya keskan ra, tirk **Cem Ozdemîr** beyanatê xo yê vîrende vat, "Prensî mîz kerda". Dêmeke Cem Ozdemîr rind zonen o ke Prens çutir mîz keno. Ez bawer a gerek Cem Ozdemîr nezdiyê prensî de vîndero. Eke mîza prensî amê, lazimixî hazir bikero û ci ra vajo: "**Birêz Prens fermo mîza xo îta bike**". Zewbî çare çîno. prens ya mîza xo erzeno dêsanê tirkan ya jî Cem Ozdemîr lazimixî nezdiyê ey de bijero.

Mîza prensî zaf talûke yo. Eke însan îta Almanya de nezdi de nêmend, mordem sono Enqere, mîz erzeno dêsanê Tirkîya, ya jî siyasetharanê tirkan. Demek lazimixî mêrik ra nezdi bicerîyo. Cem Ozdemîr ke karê xo rind bikero, ez bawer a talûke çîna.


Ecevit hurdi hurdi erzeno. Ti vanê qey roboto zîmêlîno qesey keno. Vano mîletê ma zaf birûmet o. Tew, tew ke tew, bira bira rûmet kamî kerdo vînde ke Ecevit bivîno.

Mesela zaf zelal a. prens dêsanê tirkan û siyasetharanê tirkan ra hes nêkeno. Ha eke prens yewî ra hes nêkerd, mîz erzeno ci.

Tedbîro verîn, siyasetharê tirkan meyirê Almanya.

Tedbîrê didiyin jî, Cem Ozdemîr ey rind nas keno. Lazimixî nezdi de bijero. **Dêrsim** de eke cûn (ciwîn) de gay fetêliyen, yew serva çîye înan kav nezdi de guretenê.

Ez ke cenc bîyo, mi jî mîz estene dêseno qîşla. **İsmet Şerîf Wanly**, mîz erzeno dêsene bînya ke uza konferansê Lozan virazyayo.




"RASTÎHILHATIN, DEREW XELAT IN"
DEREWA HERÎ MEZIN, GOTINA,
'DEREW NEBAŞ E' YF.
KA DEREWA KÊ, WÊ BI ÇARLEPKI
DI NAV BEHRA WANÊ RE DERBAS
BIBE?
VIR Û FORT ÊDÎ BI XELAT IN
DEREWÊN XWE JI ME RE BIŞÛNIN,
EM XÊZ BIKIN Û JI WE RE
XELATÊN SOSRET BIŞÛNIN!..
SLOGAN "BERDE, BINÊ TE ERDE!"



ELETEWŞ

Sefer SELVÎ



TARA
BÊJÎNGÊ

CEMÎL DENLÎ

tarabejinge@hotmail.com

PIRTÛK Û NÎVÎSKAREK


Nivîskarê folklandî **Peter Rastgo**, piştî pirtûkên xwe yên bi navê, *Kirasê Spî*, *Bijiyên Jijû*, *Qalikê Kîsû*, *Qîq û Terîqetên Çepgir*, pirtûka pêncan a bi navê **Magic of Drum and Double-Reed (Efsûna Def û Zurnê)** gihand ber destê xwendevanan. Pirtûk, ji nav **Weşanên Tayê Tolikê** derket. Nivîskar, piştî ku ji bo wezîfa xwe derdikeve Ewropayê û pê ve, li wir bi saya hin dost û hevalên xwe yê kurd, tevgera kurdan a netewî nas dibe û paşê tevî gelek çalakiyên wan dibe.

Rastgo, bi meş û mîtingên kurdan, ên ku bi hezaran kes tevî dibê, gelekî dilsoj dibe; kêfa wî ji wan re tê. Lê wexta ku dibîne ku kurd li protestoyan direqisin û wekî ku ji dawetê veqeriyabin, bi kêf vedigerin mala xwe, gelekî şaş dimîne. Li ser wê enerjîya ku li ber def û zurnê xerş dibe, difikire.

Li gorî dahka (îdîa) wî, ev taheb û enerjîya li ber dengê defê belasebeb diçe, ku bi awayekî zanayî bihata bikaranîn, têra avakirina şes dewletên mîna Îsralê, çar dewletên mîna Kurdistanê dikir û dikaribû **Pergala Dinyayê ya Nû** 140 salan bi paş de bixista. Nivîskar mîna keke wisa îdîa dike: Rojêkê beriya çalakiyê li Berlînê, jineke kurd ji çîrana xwe re dibêje, "Ji dêleva ku em her tim diçin, li ber def û zurnê lotikan li xwe dixin, çima em çalakîne çêtir nafikirin? Em di pêvajoyêke



* KAZIKLAMA K (mecaz)



etemek de ne. Heger bi vî hawî here, dibe ku em t êk biçin!" Cîrana wê, wisa lê vedigerîne:

"Cîranê bang kir cîranê! Berê xwe da dîlanê Pêvajoyê li ber sikranê! Wexta pêvajoyê t êk biçe Ah wa rêxistinên me hene! Xwediyê teoriya xwe ne Çavê wan li endamê zêde ye! Heyrana cîrana xwe ne!"

Rastgo dibêje ku ew li hemberî vê helwesta xemсар vê jinikê ku bi gelek kurdan re heye, metelmayî maye biryara xwe daye ku li ser dîroka kurdan lêkolînekê bike. Lewma derbasî Kurdistanê dibe; li ser dîrok û olkîlora kurdan disekine.

Di Serhildana Şêx Seîd de, yek ji sedemên t êkçûnê wisa tîne zimên: "...Wexta ku şer gur dibe, eşîr tevdekîvekin. Jon Tirk gelekî tengzar dibin. Stratejîstên şer, emû kesên ku berê li Kurdistanê walîtî û karên dinîrine û kurdan baş nas dikin, didine ser hev. Ev kesên kurdnas, bi awayekî hevbeş vê psîkolojiya kurdan rave dikin: **Kurd, li ber tayê tolikê direqisin!**.. Paşê li her pêşniyara van kesan, artêşa Jon Tirkan, 56 kesên daholvan û zurnevan kirê dikin û li hêleke şer, pê li def û zurnê dixin.


Rastgo peyre wiha dom dike: "Eşîrên li qîraxa şer, ku dengê def û zurnê diçe wan, çekên xwe datînin û govendê digerin. Ên din, ji girmîna dengê selehan, dengê def û zurneyê naçe wan û şerê xwe berdewam dikin. Lê eşîrên din, bi govendê dibilin û xwe ji bîrî dikin ku şer dewam dibe!.. Ev rewş, di serhildana **Şêx Seîd Mahmûdê Berzencî** de jî wisa ye. Ya na, tu eşîrên kurd xayîn neketine û mirov nikare ji **Kawis Axayê** ku dibêje "bi gaziya kurdan de meçe; kurd xayîn in" re, bêje eferim! (rûpela 113, paragraf 3).

Nîmskar, li ser dîroka kurdan a nêzik jî bi hûrgulî disekine û gelek mînakên cuda û yên wekhev dide. Pirtûkê jayî xwendinê ye.








ŞEKIRÊ QULQULÎ

Cem Şeker




HEŞ • BAW

IMAM CICI



ŞİŞİR



muratbatgi@hotmail.com

MURAD BATGI

EVİN NE BÊKES E, "EVİN ZIRAV E"

Euripides dibêje; "Ciwani, tu civatê di nav êşê de nahêle."

Lê ger ciwanî di nav êşê de be?

Ev demeke dirêj e, em tev de bi halê keçikeye hejdeh safî digirîn û ew jî bi hemû ciwanî û delaliya xwe bi halê me. Em çiqas di rûyê wê de bi halê xwe digirîn, ew jî wekî ku bersiv bide, bi halê me. Ji ku derê tê ev êşa zirav, ev evîna zirav, ev dilê zîz, ev rûyê ezîz?

Ez kîjan rojnameyê vedikim, li kîjan televizyonê temaşe dikim ev keçik digirî. Kêfxweş be jî, dilgeş be jî, xemgîn be jî, bi coş be jî digirî. Hemû hest çawa di girînê de têne ba hev? Hemû hest çawa bi vê girînê ve wisa zeliqîne?

Me çi kir bi vê keçikê, me çi jê xwest, me çi got jê re? Ku di şûna me hemûyan de digirî!...

Me çawa ew bi tenê hişt? Me çawa evîna wê bi tenê hişt? Ku ew niha dibêje; "Evîn bêkes e!" Ku evîn bêkes be, kî xwediyê çi ye? Ku evîn bêkes be, ax ji bo çi ye?

Ma navê hemû evînan nîn e ax? Ma navê hemû bedewiyan nîn e?

Behsa **Sevgî Înce** dikim. Sevgî Înceya ku li ser dilê wê niha du gule, du birîn hene. Sevgî Înceya ku ji bo xweş be, ji girtîgehê derket. Belkî doktor bikaribin guleyên li ser dilê wê derxin, birînen wê derman bikin. Xwezî tenê ev gule û ev birîn bûna li ser dilê me. Û xwezî tenê evîn bêkes bûna!

Sevgî Înce di pêşbaziya helbestan de, bi helbesta xwe ya bi navê "Evîn Bêkes e", xelata yekemîniyê wergirt. Binêrin çi dibêje di helbesta xwe de xwediyê vê "evîna bêkes":

Dilê min

Ku rojek were tu

Min ji bîr bikî

Bizivire û binêre li dilê xwe

Em niha li dilê xwe dizivirin. Em niha li rûyê xwe dizivirin. Lê hem di dilê me de û hem jî di rûyê me de ev keçika dilzîz, ev keçika xwediyê evîna bêkes digirî û her digirî...

Dilekî wisa derxistiye holê ku dilê tu kesî nikare xwe jê dûr bixîne. Dilekî wisa di nav xwe de afirandiye ku mirov bi her awayî û çiqas dûr be jî, dibîne. Ji mirovên pak û delal bigirin heta mirovên nekes, nikarin xwe li ber vî dilî rabigirin. Û bi awayekî qoroyê, em digirîn. Ew solîstê vê qoroyê û em qoroya vê solîstê. Wê kengê biqede ev stran? Birîn wê kengê derman bibin? Gulle wê kengê ji ser dilê me û ji sînga me derkevin? Tu kes nizane!

Dema ku ciwan ji vê êşê xelas bin. Dema ku evîn bêkes nemînin. Dema ku di tu rojname û televizyonan de keçikên ciwan û bedew negirîn.

Ey keçika dilzîz û delal! Îro ciwan bi êş in, lê evîn ne bêkes in. Herkes li dû wê evînê ye, ji ber wê jî ne bêkes e, lê wekî navê te Sevgî Înceye "Evîn Zirav e" û tenê tu dixwazî nîşanî me bidî û tenê em nabînin!..







ZILITO

rewşa wî rewşa kerê nêr e

Comé



camerfiraxsho@hotmail.com





TIRTIRE

Di her civakê de "tirtire" hene. Tirtire, li gorî mezinbûna civakê yan tirtireyê gundekî yan bajarekî yan jî tirtireyê welatekî ne. Tirtireyên komên tevgereke civakî jî hene; tirtireyên eşîrê, tirtireyê terîqetekê, tirtireyê tevgereke siyasî. Tirtireyên huner û edebiyatê, tirtireyên zanistê jî hene. Ew tirtireyên kîjan komê dibin bila bibin, ew her tim li pêş in; peyva wan pere dike, ji civakê hurmetê dibînin. Ger bûyereke qenc nehatibe fêmkirin û pêwîstiya şîroveyê hebe, guhên civakê li ser wan e.

Di her govendê de ew sergovend in. Def li ber lingên wan lêdikeve, zirvevan di kerika guhên wan de li zimê didin; goştê sor î nerm li ber wan tê danîn.

Rojnamevan û televîzyon mîkrofonê didin ber bêvila wan.

Diaya fitarê ew dikin, zeytûna fitarê ew dixwin.

Tirtiretî mîna rutbeyekê ye, dema li ser milê yekî ket, êdî heta mirinê bi wî re ye. Tirtire rutbeyê bi xwe re dibe gorê.

Şabaşgerên wan hene. Şabaşger, peyvên pesnê yên herî xweş ji bo wan diafirînin.

Tirtire ne mirovên pîrbêj in; ne ji wan kesan in ku kî singekî bikute, ew tûrekî pê ve kin. Zû bi zû bersiva pirsan nadin. Li dûr dinêrin û dûr û dirêj diramin, paşê bersiva xwe ya herî kûr didin. "Himm!.." Xwediyê pirsê, ji vê "Himm!"ê mane û bersivên cur bi cur dertînin. Pirskar, ji bo ku cahiltiya xwe nedin dest, tu pirsên nû nakin.

Tirtire **Quran** nexwendiyê, belê îmam e. Tirtire **Şekspîr** nas nake, lê bûye hîmê edebiyatê. Tirtire nizane **Pîvanên Kopenhagê** çi ne, lê siyasetmedar e. Ji wî ye **Emedê Xanî** muxtarê gundê cîran e.

Tirtire **"kurtçî"** ye. Xwendina zimanê kurdî nizane. Wî kovara **Pîne** tenê di reklama **Televîzyona Medyayê** de dîtîye û jê hez kirîye. Ku mirov tirtire ji nêz ve nas dike, dibîne ku ew meşka nepixî ya li ser avê ye.

Tirtireyê siyasetmedarê kurd ji ber ku nikare çar tîpên kurdî yên ji tîpên tirkî cuda ji ber bike, di xwendina kurdî de "ummî" maye. Tirtire ne pêşeng e. Navê wî li ser e, pêşengê tirek e. Mixabin tirtire, di her demê de û di her civakê de hene û wan tim li pêşiya civakê ji xwe re cihek peyda kirîye.


Xwedê me ji tirtireyan bistirîne!..

MIRIN


Revhat Aslan



HER TIŞT WINDA DIBÛ Û DİQÛ / HILDIWESIYA BAJAR / JI CIHÊ XWE DILIVIYA / BELAWELA DIBÛ...
---/GAZA TEQIYANÎ / A KU XWÎN Û AV JÊ DİQÛ / WINDA DIBÛ Û DİQÛ BAJAR
MIRIN, BERBÛYEKE BENGNE RÊŞGIRÊDANE



JÎ BIRAZAVATA BÛKÛ ZAVÊ / BÎ HÊRS Û ŞID
LÎ BER WÊNEKÊŞEKÎ HEVKÊŞEYA JÎ XWELIYEKE HIŞKBÛYÎ DÛPARAST
WÊRANÊN NIKÛ NÛ / NÎŞANEYA ŞER
LÎSTIKÊN DÎNÛ VE AVAKIRINE / BÎ SERKEFTINÛ TÊKÇÛNAN!..
JACQUES PREVERT (TIRKÎ RÛBÎ ZERVA)







SEWÎRIN: YILKIYA BIRAKMA, BAŞIBOS ETME.





X E L Î L Z I R A V A V



ÊDÎ KES NIKARE BIFILITE;
ÊN KU DIREVIN JÎ YÊN KU DIFIRIN JÎ!



EHMED HUSEYNÎ

Tebinî: Ehmed Huseynî, heya demekê wê nenivîsel.. Çavê we ronîl..

DANEZANA OHALÊ YA MAFÊN MIROVAN!...

*Ji bilî mamoste, xwendekar, karker sendîkavan, koçer, dêmanî, filleh, şivan û gavanan her kes li ber qanûnên "OHA(L)"ê û "Netekîm" li ber zagonên "BUHAL"ê wekhev e û ji xeynî mirovên ku doza hebûna xwe, dîrok, ziman, çand û hunera xwe bikin, tu kes di bin koletî û bindestiyê de nayê girtin.

*Mafê her reştehlîk û simbêlboqî heye ku carekê xwe şaş bike û serîkî li dadgeh, zindan û qereqolekê bide û dibin rehm û duayên "Silêmanê Xortum, Ehmedê Ceyran, Brahîmê Tevşo û Osmanê Cemed" re bibore.

*Mafê her xwediyê xiftan û cemedaniyê heye, hîna ku nehatiye biçavkirin, bi xwe re 10 kîlo ceyran, 20 kîlo cemed û 15 mêtro hevsar bigerîne û di biçav de jî berî ku ebûqatekî bixwaze, navê hevalên xwe, êl û eşîra xwe û heta Adem û Hewa qewmîyeta xwe li gorî alfabeya **Celadet Bedirxan** bi rêzê ve bijmêre û xwe ji "aganîgî, naganîgî" xelas bike.

*Mafê her mêrxas û babegîfî heye, berî ku di biçav de were windakirin an di kolanekê de were kuştin, serî li dadgehên navneteweyî bide û doza diravên heşîn û kefenekî bêbêrîk bike.

*Mafê her kurik, lawik û zarokî heye ku ji bo ku şopên "îşkence" û lêdana xwişk û birayên xwe û dermanên dê û bavê xwe, li seyrangê û kolanên dewlemendan û li **Galeria, Akmerkez** û li ber rawestegehên destmal, benîşt û biletên qelp bifroşe.

*Mafê her zava û bûkê heye, dema ku bizewice, bi xêl û xêliyên xwe û bi dahol û zimciyê xwe ve, **şeva zîfafê** li qereqolê biborîne û di odayên qral û qralîçeyande, di bin ronahiya ceyranê de bi sazband û dengbêjan re (*cedîn dede, neslîn baba hep kahraman...*) pêşî bireqise û dû re jî ji bo "Balayî"yê

here "Qesra TEMÊ."

*Mafê her bawermendî heye ku bi tenê baweriyekê bîrdozekê, alekê, welatekî, olekî û ker û makerekê biparêze, 365 rojê **Dewê Sûsûrlûkê** vexwe û **Kofta Sultan Ehmedî Osman** bixwe. An jî dema ku xwediyê bîr û bawerî û hest û ramanên cûda be, girtîgehê, koçkirinê û "Newala Qasaba" bide ber çavên xwe.

*Mafê her hîlbijêrî heye, ku şaredar, nimînende, keya û namzetên bêzar, bêpî, bêçav, bêmejî, bêguh û bêpasaport hîlbijêre û wan ji "dek û dolap û tabûtên malbata Osmaniyan" biparêze...

*Mafê her endam, rexnegir, rêveber û qumarbazî heye, dema ku here sazî, komele, qehwexane û avdestxaneyê sed mêtro li pişt xwe binihêre an jî pisporê dengê erebe, minibûs, têlsîz û rêveçûn û tîpa mirovan be.

*Mafê her aşîxwazî/ê heye, ji bo biratî, wekhevî û azadiyê çalakîyan bike û "qatkiyê sunmîşe surecê" bike, lê ji ber ku qadên me şil û pil in û ne bi giya û çîm in, (*em lêborînê dixwazin*) ji ber tendurîstiyê em qadên Koln, Dûselldorf, Parîs, Atîna, Londra û Amsterdamê pêşniyar dikin.

*Mafê her evdê Xwedê heye, ji bo çand û hunera xwe **Televole, Memolî, Reha Muxtar** û Çarkifelekê ji Bayê Felekê bêxeber temaşe bike û **Playman, Playboy, Pineboy, Kermêşboy, 2000'de Gundemboy, Rewşenboy, Azadiya Welatboy û Doxindankê** bistîne, bixwîne û bigerîne!..

*Mafê her eşîr, bavik û malbatê heye, ji bo ku şêr û kevok nekevin nav rez, dehl û bostanên wan, veşerî gundê xwe û bibin "qoricî" û xwe biparêzin.

EVDILA KOÇER

BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Van rojan li hemû kullis û şevbûherkan pesnê we didin û dibêjin "Hûn welatparêz in, babegit in û 'surecê qavramîs' dikin." (Tew, mala min sewitî.) Hûn jî dizanin ku wan "Biranîhên Apê Musa" bixwenda, de manê welêt", lê dîsa jî ev peyvên neqîsandî, qûna we mezin dikin û hindik maye ku hûn pê bifirin. Ka bêjin "tir û das" li ku hûn li ku. Hûn hîna jî welatparêziyê ji bo navê xwe bi kar tînin û çî dek û dolap hebin hûn dîcenbinin. Çî gor û mezê hebe, hûn tilika xwe dixinê. (qolay gêsînl)

QUŞXANE Ên berî nîvro...



Hevalê jixwerazî!... Hûn bi qûna xwe, biborin bi devê xwe dibêjin. "Eger ku kêmasiyên min hebin, rexne bikin, da ku ez 'yênelmîs' xwe bibim". Lê hûn di dilê xwe de dibêjin, "Xwezî her kesî ez 'yaglamîs' bikira ma." Li qusûrê nenêre, li ba me "yag" tune. Lê belê nanê sêlê û gûyê malê heye. Jixwe kî çî bêje, ne xema kirê we ye. Bawerîya we ne bi Îsa û ne jî Mûsa tê. Kî bêje, "siya we xwar e!", hûn bi dek û dolaban îmana wî/wê diçîkinin!...

MOZ Ên piştî dana pez



Hûn li malê bi de û bavê xwe re pevdîtin û nîfiran li xwişk û birayê xwe dikin. Li ser kar jî, hûn bi hevkarên xwe re li hev nakin û hindik maye ku hûn û jina xwe jî serê hev bibin!... Çî hikmeta Xwedê be, em nizanin, lê dîsa jî dema ku bayê we bilind dibe, hûn radibin li ser kur-siyar wekî siyasethemmedarên tirkî qala aşî, biratî, demokrasî û bindestîya jinan dikin. Xwedê hefza Ezraîl ji we bike!

CAŞIK Ên ber êvarê...



Di pêserojê de hûnê bi nexweşiyê giran biborin. (Xwedê neyne serê hazir û neyarî!) Sê çar mehan hûnê di nexweşxaneyê de razên. Ji bilî malbata we, ji mecbûrî, jî du sê hevalan, piştîkê jî nayê serdana we. Ew keça ku hûn 'tek tarafî' jê hez dikin jî nayê. Lewma nexweşîya we de girantir bibe, lê dawîya dawî hûnê bas bibin. Êdî hûnê 'jiyaneke nû û hevalên nû' hilbijêrin.

ZIRNE Ên nivê şevê...




Wellehî, billehî û tillehî vê carê em xelîtin û hûn rast derketin (şimarmîs nebin!). Ev şes meh bû keçeke bedew û nazenî li dora we lotîk diavêtin, lê we ew "taqmîs" nedikir. Çiqas me digot: "Malmîrat, ma tu bedewbûna wê çawa nabînî, tu kor î?", we jî digot: "Malmîrat, ma hûn jî çawa nezani û ehmeqîya wê nabînin?..." Çawa ku me bihîst, wê keça qaşo bedew mal û milkê yekî dizîye û ji kumar-bazekî re revîyaye.

HUDHUDK Ên heft mehî hatine...



Hevalên heja, we Ehmedê Xanî dereng nas kir û ji ber vê yekê hûn hinekî diçehirin jî. Hûn 'êdî li her deverê li ser helbestvanî, evîndarî û welatparêziya wî guftûgo û nîqaşa digerin û di nêz de jî hûnê herin Bazîdê ser tîrba wî. Cama jî bi hinek 'tirkmanca' re hûn vê helbesta wî dixwînin: "Ez mame di hikmeta Xwidê da, kirmanc di dewleta dinê da, aya bi çî wechî mane mehrûm, Bil-cumle ji bo çî bûne mehkûm" (Serê Rahşanê û golika mala şex kim, em jî nizanin ji bo çî em bûne mehkûm...)



Rojnameya fûltonom

KUNDIR

Xwesûya Pîneyê

Hejmar: 3 Piştî Îsa 2000 Xwedî û tiştên din: Faysal Dagli (Li ser navê weşanxaneya T&T) E-mail: nilamed@go.com


Şerê Sêyemîn ê Cîhanê bi dawî bû!

KAYA Û BUÇAK LI HEV HATIN!..

NAVENDA NEÇÊYAN

Şer û qayîşkêşana navdarên Kurdistanê û Rojhilata Navîn û Qoreya Bakur, **Yaşar Kaya** û **Serhat Bûcak** sekinî. Kundirpress ragihand ku Neteweyên Yekbûyî, Hereka Îslamî ya Kurdistanê û **Bill Clinton** ji bo vê yekê navberçîtî û qasidiyê dikin. Li gorî ku hate diyarkirin, wê bi finansmana **Kuweytê** li Almanyayê rojnameyek bê derxistin, **Yaşar Kaya** û **Serhat Bûcak** jî bi hev re û fiiftî fiiftî bibin xwediyê rojnameyê. Rojekê navê Kaya, rojekê Bûcak dê li ser bê nivîsandin. Her wiha nivîsên her

duyan, bi dorê, wê wekî semivîs werin weşandin. Dîsa dîplomaya **Yaşar Kaya** a **Lîseyaya Kabataşê** û ya **Serhat Bûcak** a fakulteya hiqûqê wê ji aliyê **Neteweyên Yekbûyî** ve di statûyekê de bêne qebûlîkin. Wekî din, wê her du alî dokûmatên li dijî hev îmhâ bikin. Li aliyê din, ji bo lihevhatinê wê kokteylek bê sazîkin; ji bo vê yekê wê her du navdarên kurd mazûbanîyê bikin. Ji ber ku **Serhat Bûcak** Sewrêgî ye wê **çigkofte** yanê kiftaxafê çêbike, **Yaşar Kaya** jî wê bi pêşgîrê xwêdana **Serhat Bûcak** paqij bike. Piştî strandina kiftaxafê, wê her du alî îltîfatan li hev bibarînin û neyaran biteqînin.



PROF. DR. XWIŞKA CÎNCÎ

Birêz **Xwişka Cîncî**, "ez keçeke gundî me, dest û bajar nedîme, ava çem û kanî me", lê dixwazim bibim hunermend. Gelo ez çî bikim? **Asiye Dengnemoğlu/Amed** Qîza min ji bo ku tu bikarîbî bibî hunermend, divê tu hefteyekê serê xwe neşoyî, her roj sê hêkên xavî yê dîkê sor bixwî û şefeqê zû rabî, azanê bixwî. Û paşê di înternetê de bikevî malpera **Înstîtûta Kurdî ya li Berlînê** (<http://members.aol.com/kurdins>). Li wir ji bo kesên ku bixwazin bibin hunermend, hin formûl û reçete hene qîza min!... **Xwişka Cîncî** bavikê min mir. **Ei Esas û Ei Baas**, ew bavkê me hemûyan bû. Piştî ku mir, ji ber ku têr şîn nekirin, min giliyê çend cîranên xwe kir û ew yekser çem û çem çûn! Lê sebra min nayê, ezê bêyî wî çî bikim? **Xwedê me bêbavîk nehêle. Rewşa min xerab e. Ji bo ku sebra min were, min giliyê çend cîran û xizmê n xwe yên din jî kir. Bêgîlî sebra min nayê. Min posterê bavikê xwe çirand û avêt hewşê hevalê xwe û giliya wî kir. Wî, pere bi deyn nedabûn min. Ew jî av û av çûl. Ez hêvî dikim ku tuyê bersîvekî baş bidî min an jî tu zanî.**

Abdulkeremet Bin Baasî El Muxaberatî/Qamişlo

Not: **Xwişka Cîncî** çûyê ser destavê. Ji ber sedemên teknîkî nikare bersîva vê pîrsê bide. **Kundir.**


Li Ewropayê **Kongreya Saziyên Semitandî** hate lidarxistin. Li gorî Kundirpressê, Yekîtiya Nivîskarên Bêpirtûk, Yekîtiya Rojnamegerên Belengaz, **Yekîtiya Xweşîsêrzan**, **Rêxistina Mizdançîyan**, **Yekîtiya Şoforên Bêehliyet**, **Yekîtiya Serokên Bêpartî**, **Yekîtiya Entellektûelên Bêînternet**, **Rêxistina Doxînsistan**, **Yekîtiya Dengbêjên Bêqaset** û **Yekîtiya Kosiyên li Derveyî Hêlîna Xwe** tevî kongreyê bûne.

Li gorî biryara ku di kongreyê de hatiye wergirtin, ji van saziyan wê hikûmeta sirgûnê bê damezrandin. Her wiha hatiye 'destnîşankirdin ku le **Rojhilatî Nawarast barîdox zor aloz e**' lewma divê kongrê xwe li hemberî hemû bûyer û rûdanan amade bike. Ha te dî siberoj dibe ku firsend çêbe, ew jî veşerîyan welêt û wan hikûmeta xwe li wir îlan kir.

Serokê YNK'ê Celal Talabanî îltîca kir. Li gorî sîxurên me bûyer wiha qewimiye: **Rojekê** ji Ewropayê heyeteke resmî bûye mewanê maibata **Talabanî**. **Xanima Mam Celal, Xêroxan**, ji bo şîva mewanan ji **Talabanî** çend kîlo goşt, birinc, xoşaf, masî û filan û bêvan xwestine. **Mam Celal**, ku serokê **YNK** ye û serokxakî **Herêma Soran** e, ji **Xêroxan** re gotiye, "**PDK** dahatûyê **Deriyê Xabûrê** nade me. **Pere nîn e!**" Ez nikarim pêwîstiyên tu dixwazî, bikirim."

Li ser vê yekê **Xêroxan** bi şimika lingê xwe êrîşî **Mam Celal** kiriye û gotiye, "Ger tu goşt neyinî êvarê neyê malê!..." Piştî derbeyên şimika reqreqîn, **Mam Celalê** ku aciz bûye, gotiye, "Bes e êdî!..." û çûye nûnertiya **Neteweyê Yekbûyî** ya li **Silêmaniye** û ji wan mafê penaberîyê xwestiye.

NÛÇIK



Tekzîp

Tiştê ku heta niha di **Kermês, Kundir, Pîne, Zirpîne** û yên din de, li ser min hatine nivîsandin, tev derew in. Ez we protesto dikim. Ez mirovekî pir cidî û giran im.

Cahîr Merwan

pîne

YNK Û PDK DÎSA ÇÛN WASHINGTONÊ.
QEY KURD NIKARIN DI NAVA XWE DE AŞTIYÊ PÊK BÎNINI

OH MAY XWEDÊ!...
MIROV NIKARE WE
BIHEVRE BIHÊLE...
WE DÎSA ŞER KIR
NE WISA?..

